٠من اجل تحطيم المرأة ٠ وانا كرفيقة ثورية اقول لهذه الدول الاستعمارية والبرجوازية اننا نحن كنساء روج افا لن نكسر ارادتنا ونضالنا ضد المعتقد الذكوري والاحتلال الراسمالي

(ريما الخضر)

ارتبط مصطلح روج افا بمفاهيم ودلالات الثورة والشهادة ، وتركت هذه الثورة ارثاً كبيراً من الضحايا وقدمت عدداً كبيراً من الشهداء وأسست واقعاً جديداً يسع الى تحقيق منطقة امنة او الية امنه ولكن الاحتلال التركيا يحاول دائما بشن هجمات على مناطق روج افا حيث سيطر الاحتلال التركي على العديد من المناطق في روج افا ومنها سري كانيه وكري سبي ، ويقوم دائما بتعرض للمنطقة وتهجير السكان منها وزعزعت الامن والاستقرار فيها ، والهدف الاساسي التركي من هذه الهجمات هوا احياء داعش ودعمه، مما يؤثر بشكل سلبي على الحرب ضد هذا التنظيم وجرائمه والقضاء عليه :

(نهلة محمد)

مرت ثورة روج افا بمخاض عصيب نتيجة الضغوطات التي تعرضت لها من الداخل والخارج ، ففي البداية عانت هذه الثورة من قلت الامكانيات ، ورغم هذا الأ انها قطعت اشواطاً كبيرة في وقت قصير حتا تصل الى اهدفها في حرية شعبها ، واحرزت العديد من النتائج واهمها حرية المرأة حيث كانت المراة تلعب دوراً اساسياً في هذه الثورة فكانت قيادة ومعلمة وأم٠٠

وبعد تعرض منطقة روج افا للأحتلال التركي ومرتزقتها كان للمراة ايضا دورها ، ولكن في هذه الاثناء تعرضت النساء للقتل والاعتداء من قبل مرتزقتها الاحتلال التركي الفاشي اثناء عبورهم الحدود التركيا مثلما حدث معا الفتيات في منطقة القامشلي وكوباني حيث تعرضت هذه الفتيات للاغتصاب وقتل الشباب الكرد واجبارهم واستجرارهم للعبور الى الاراضي التركيا وكل هذا يؤدي الى اضعاف ثورة المرأة ودورها لانها ترى في ثورة المراة وتطورها في المجتمع تهديداً وهلاكاً لها لتفرض على المراة حياة رجعية وظلمية يسودها الجهل وبعد تضحية المراة المستمرة تحققت تغيرات .كبيرة في ثورة روج افا واصبحت المرأة فيها رمزاً وقدوة لجميع النساء في العالم ٠

ME BI SÎLAHÊN XWE AVA KIR EM Ê BI SÎLAHÊN XWE BIPARÊZIN

Jin dema ku berî 5 hezar sal an parêzvanê jiyaneke wekhevîxwez û azadîxwez bû, bi derketina holê milkê taybet li dijî kolekirinê derket. Jinan li dijî vê berxwedaneke ku bi sed salan dewam kiriye pêşkeş kir. Lê di dawiyê de têk çû. Di dirêjahiya dîroka civakan de jinan her tim têkoşîn û lêgerînên xwe yên azadiyê berdewamkirin. Di nav raperînên koleyan û gel ku pêşketin de cihê xwe girtin.

Di dîroka hîna nêzik de jî, di şoreşa Fransa ya 1789'an de daxwazên wekhevî, azadî, edaletê ku bûrjûwaziyê anî ser ziman daxwazên jinan jî bûn. Ji ber vê yekê jinan xwe bêsînor tevlî têkoşîna şoreşê kirin û di herî pêş de şer kirin. Lê mixabin di wê demê de wekhevî, azadî û edalet tenê ji bo çîna bûrjûwaziyê bû maf. Piştî ew şoreşa bûrjûwayî di biryarnameya ku derketiye de jin wek mirov jî nehatin dîtin. Jinan li dijî vê biryanameya mafa jinan amadekirin. Di dema desthiladariya bûrjûwaziyê de gelek jinên ku di têkoşînê de derketin pêş bi rêya giyotine (qinere) hatin îdamkirin. Lê êdî pêşiya têkoşîna azadiya jinê vebû.

Di sala 1871'an de Elmaniyan êrîşa Fransayê kir. Di vê êrîşê de artêşa Fransayê têk çû. Elmanan xwe spartin Parîsa ku peytaxta Fransayê bû. Lê karker, bindest, jin û kedkarên Parîsê rê nedan Leşgerên Elmanyayê. Parastina Parîsê kirin. Jinan dîsa di pêşiya eniyên şer û her qadê de bi awayekî çalak cih girtin û di dîroka karkeran de ixtidara yekem a karkeran ku wek komûna Parîsê tê bi nav kirin damezrandin. Lê gelek dirêj nake. 71 roj berdewam dike. Lê ji karker û bindestan re tecrûbeyeke mezintirîn hişt.

Di sala 1917'an de li Rûsyayê di seriyê şoreşa ku li dijî bûrjûwazî û zateganiya (arîstokrasî) Rûsyayê dest pê kiriye de jin hebûn. Bi bandora şerê yekemîn a cîhanê yê parvekirina emperyalî de beşa ku herî zêde bêkarî, xizantî jiyan dikir jin bûn. Bi şiyara em "Nan û gul dixwazin" di 8'ê Adarê de derketin kolanan û bûn agirdêrên şoreşê. Vê carê di pêşengtiya Lênîn de dikdatoriya proleteryayê (karkeran) li Rûsyayê hat damezrandin. Bindestên bindestan jin li vir bûn şirîkên ixtidarê. Gelek mafên wek perwerde, hilbijartin û hatin hilbijartinê, ji bo karê wekhev fona wekhev, mafa berdan, mafa kûrtaj, mafa mîras, mafa rayeya girtina zarokan hatin bi dest xistin. Li vir şoreşa proleteryayê hêz û sirûşeke da jin, karker û gelên bindest ên cîhanê. Pêşiya têkoşînên zayendî, netewî û çînî vekir.

Di dîroka têkoşîna Kurdistanê de jin her tim bûn şervan û pêşeng. Di serhildana Agirî de Yaşar, di serhildana Koçgîriyê de Zarîfe, di serhildana Dêrsîmê de Besê hinek ji van jinan in. Jinan di nav têkoşîna azadiya Kurdistanê de têkoşîna zayendî û netewî kirin yek. Bûn îradeyeke kolektîf (hevbeş) û hêz. Di pêşengtiya tevgera azadiya Kurdistanê ya PKK'ê de bi damezrandina partî û artêşa jin tecrûbe û daneheveke girînk a rêxistinî, polîtîk, leşgerî, bîrdozî pêşkeşî têkoşîna azadiyê a jinên cîhanê kir.

Di nav serhildanên ku di sala 2011'an li Tûnûs des pê kir û belavî Afrîkaya Bakur bû di herî pêş de cih girtin. Xwestekên xwe yên azadiyê bi awayekî gelek xurt qîrinkirin. Lê ji partî û bernameyeke ku pêşengtiya têkoşîna wan bike mehrûm bûn. Dewleten emperyalî û dewletên herêmê yên paşverû ji bo berjewendiyên xwe mudaxeleyî van welatan kirin û pergala kapîtalîst a zilamperest ji nû ve avakirin.

Dema li Sûrî şoreşê dest pê kir dewletên emperyalî û dewletên herêmê yên paşverû li vir mudaxale kirin. Şerekî navxweyî ya paşverû dest pê kir. Me tena li Rojava şoreşa xwe bi şopandina xeta ku wek rêya sêyemîn tê bi nav kirin bi ser xist.

Li Rojava hebûna partiyekî xwedî stratejiya ku ixtidarê bi rêya sîlahê bigire û bi sîlahê biparêze serkeftin anî. Hema piştî destpêkirina şoreşê bi bi demeke gelek kin wek pêşengê komûnîst û jinên komûnîst ku xwediyê bernameya şoreşa jinê jî di nav şoreşê de cihê xwe girt.

Şoreşa me ji destpêkê de wek şoreşeke jinê pêş ket. Ev rastî jinan bi îradeya xwe ya kolektîf û rêxistinbûna xwe, di dest de sîlah ji parastina şoreşê heta avakirinê bi cihgirtina di her astê de bi ser xistin. Bû guleya nîşanê ya serdema şoreşên jinê yên sedsala 21'emîn. Di tevahî cîhanê de bû hêviya jinan.

Artêşa jinê YPJ'ê ya ku hema piştî şoreşê di demeke kin de hatiye damezrandin di parastina şoreşa me de roleke girînk lîst. Jinên YPJ'yî bûn xewnên bitirs ên DAÎŞ'ê. Bi şervantiya xwe ya fidayî axên Rovaja û şoreşa jinê parastin. Şoreşa me di şexsê jinên wek Arîn Mîrkan, Sarya Ozgûr, Avesta Xabûr, Barîn Kobanê û bi hezaran jinên ku em nikarin navên wan bijmêrin de bû nîşan.

Temsîla wekhev, sîstema hevserokatiyê, rêxistinên xweser ên jinê bûn hêmanên pêkhêner ên şoreşa me. Rêxistinên wek HPC-Jin, Asayişa Jin, Meclîsên Edaletê yên jin hatin damezrandin. Zewicandina di temenê biçûk de û Zewaca zêde hat qedexekirin. Jinan mafên wek berdan, mîras û girtina rayeya jinê bi dest xistin. Lê hîna hebûna feraseta resmaliyet û serdestiya zilam hebûna xwe berdewam dike. Erkên pêşxistina şoreşê ber bi asta sosyalîzmê ve li pêş me disekine.

Di heman demê de îro erka me ya parastina şoreşê berdewam dike. Piştî ku şoreşa me serkeftineke xuya bi dest xist Dewleta Tirk û çeteyên wê yên ku Emerîka û Rûsyayê rê li ber vekiriye berê Efrîn, piştre Serê Kaniyê û Girê Spî dagirkirin. Dagirker dixwazin hebûn û nasnameya jinê tune bikin. Bi sedan jin bi zorê hatin revandin, rastî tacîz û destdirêjiyê hatin. Niha jî em bi gefên êrîşên nû ve rû bi rû ne.

Wek gelê Filîstînê em mecbûr in ji bo şerên ku dirêj bike, ji bo têkoşîn û berxwedana gel a bisîleh amade bibin. Me wek gelê Bakur û Rojhilatê Sûrî tecrûbeyên girînk da ser hev. Di em wek gel ji sala 7'de heta 70'ê wek leşger xwe bi rêxistin bikin û amade bibin. Pêwîst e herkes li dijî êrîşên gengaz bi fêrbûna sîlahan amade bibe. Herkes di nav komîn û meclîsan de cih bigire. Divê em hewldana rêxistinkirina gelê xwe di van deran de bibin. Divê em dana Hêza Parastina Cewherî (HPC) de cih bigirin. Li dijî hemû êrîşan bi hêza ku em ji şehîdên xwe yên jin digirin di nav berxwedana gel a bisîleh de di herî pêş de cih bigirin. Pêwîst e em li dijî rêbazên şerê taybet ku ji bo di hundir de hilweşandina şoreşê, ji bo tunekirina îtîfaqa nav gelên me, ji bo xurtkirina çanda kapîtalîzmê ya dejenere bûye û herî zêde jî li dijî hedefgirtina şoreşa jinê têkoşînê bimeşînin.

Jinên Komûnîst ku di nav Rêxistina Jinên Komûnîst xwe rêxistin kirine xwedî bernameya şoreşa jin a ixtidara dumend e ji destpêka şoreşê heta îro hem di parastina hem jî di qada avakirina şoreşê de bi bedêlên mezin cihê xwe girtin. Bi heman şêweyê jinên komûnîst ku bi Rêxistina Jinên Komûnîst zanebûna şoreşa jin û xweparastina jinê xwe rapêçandin bûn pêşengên komînîst ên şoreşa jinê. Ji şehîda MLKP'ya ya jin a yekem di Rojava de Sarya Ozgûr, Ivana Hoffmann, Raperîn Dîcle heta pêşenga ciwanan a komûnîst Zîlan Destan di nav têkoşîna bisîleh de bûn pêşengên jinên komûnîst.

Parastina û pêşxistina şoreşa jinê, li Rojhilata Navîn mezinkirina şoreşa jinê wê bi bilindkirina têkoşîna azadiya jinê gengaz bibe. Îro ev erka bi rûmet li ser milên me ya jinan e. Wê demê divê em ne gavek sê çar gavan bi hev re derkevin pêş. Li ser milên me sîlahên me em di nav refên TKŞ'ê, JKŞ'ê û CKŞ'ê ya ku xwedî bernameyeke şoreşger û komûnîst de xwe bi rêxistin bikin, em ev erka bi rûmet bi cih bînin. Teqez em ê ser bikevin.

نحن نبني بأسلحتنا وسوف نحمي بأسلحتنا

عارضت النساء ، عندما كن وصيات على حياة متكافئة وحرة قبل ٥٠٠٠ عام ، جمع الممتلكات الخاصة. لقد قاومت النساء هذا الأمر منذ مئات السنين. لكنها فشلت في النهاية. على مدار تاريخ المجتمعات ، ناضلت النساء دائمًا واستمر في سعيهن من أجل الحرية. أخذت مكانها بين اغتصاب العبيد والأشخاص الذين طوروها.

حتى في التاريخ الحديث ، في الثورة الفرنسية عام ١٧٨٩ ، كانت مطالب المساواة والحرية والعدالة التي أبرزتها البرجوازية في المقدمة هي أيضًا مطالب النساء. لهذا شاركت النساء في نضال الثورة إلى أجل غير مسمى وقاتلن في المقدمة لكن لسوء الحظ في ذلك الوقت كانت المساواة والحرية والعدالة حقًا للطبقة البرجوازية فقط. لم يُنظر إلى النساء على أنهن بشر في المرسوم الصادر بعد تلك الثورة البرجوازية. المرأة مستعدة ضد هذا القرار الخاص بحقوق المرأة. خلال الحكم البورجوازي ، تم إعدام العديد من النساء اللواتي أخذنا زمام المبادرة في النضال بالمقصلة. لكن الآن انفتحت جبهة النضال من أجل تحرير المرأة. افتتح يوم الجمعة.

في عام ١٨٧١ غزا الألمان فرنسا. هزم الجيش الفرنسي في هذا الهجوم. استسلم الألمان لباريس التي كانت عاصمة فرنسا. لكن العمال والمضطهدين والنساء وعمال باريس لم يسمحوا للجيش الألماني. تم الدفاع عن باريس. لعبت النساء دورًا نشطًا مرة أخرى في الخطوط الأمامية للحرب وفي كل مجال وأسست القوة العمالية الأولى في تاريخ العمال المعروفة باسم كومونة باريس. لكنها لا تدوم طويلا.

تستمر لمدة ٧١ يومًا. لكنها تركت خبرة أكبر للعمال والمضطهدين.

كانت هناك نساء في روسيا عام ١٩١٧ في أعقاب الثورة التي بدأت ضد البرجوازية الروسية والأرستقراطية الروسية. تحت تأثير الحرب العالمية الأولى ، كان التقسيم الإمبراطوري هو الجزء الذي تعيش فيه النساء الأكثر بطالة وفقرًا. ونزلوا في ٨ آذار بشعار "نريد الخبز والزهور" وأصبحوا محرضين على الثورة. هذه المرة تأسست دكتاتورية البروليتاريا (العمال) في روسيا تحت حكم لينين. كانت النساء المضطهدات هنا شريكات في السلطة. تم منح العديد من الحقوق مثل التعليم والانتخابات والانتخابات ، والتمويل المتساوي للعمل المتساوي ، والحق في الطلاق ، والحق في الإجهاض ، والحق في الميراث ، والحق في حضانة الأطفال. هنا أعطت الثورة البروليتارية القوة والسلطة للنساء والعمال والشعوب المضطهدة في العالم. لقد فتح الباب أمام الصراعات الجنسية والعرقية

لطالما كانت النساء مقاتلات ورائدات في تاريخ النضال الكردستاني. يسار في انتفاضة أكري ، في انتفاضة كوجري ، بيس في انتفاضة ديرسم بعض هؤلاء النساء. وحدت النساء النضال الجنسي والوطني في النضال من أجل حرية كردستان. كانت هناك إرادة وقوة جماعية. في طليعة حركة تحرير كردستان التابعة لحزب العمال الكردستاني ، قدم تشكيل حزب وجيش نسائي خبرة مهمة وبيانات تنظيمية وسياسية وعسكرية وأيديولوجية للنضال من أجل تحرير المرأة في جميع أنحاء العالم.

من بين الانتفاضات التي بدأت في تونس عام ٢٠١١ وامتدت إلى شمال إفريقيا كانت في المقدمة. تم الصراخ بصوت عال مطالبه بالحرية. لكنهم حُرموا من حزب ومن برنامج لأخذ زمام المبادرة في نضالهم. تدخلت الدول الإمبريالية والدول الإقليمية المتخلفة في هذه البلدان من أجل مصالحها الخاصة وأعادت بناء النظام الرأسمالي الأبوي.

عندما بدأت الثورة في سوريا ، تدخلت هنا الدول الإمبريالية والدول المتخلفة في المنطقة. بدأت حرب أهلية متخلفة. لقد نجحنا فقط في ثورتنا في روج افا باتباع الخط المعروف باسم الطريق الثالث.

في روج افا نجح وجود حزب لديه استراتيجية للاستيلاء على السلطة بقوة السلاح والدفاع عنها بقوة السلاح. بعد فترة وجيزة من بدء الثورة ، حلت محلها لفترة وجيزة كرائدة في الشيوعية والنساء الشيوعية اللواتي كان لديهن أيضًا برنامج ثورة المرأة في الثورة.

تطورت ثورتنا منذ البداية كثورة نسائية. هذه الحقيقة جعلت النساء بإرادتهن الجماعية وتنظيمهن في أيدي الأسلحة من الدفاع عن الثورة إلى إعادة الإعمار بنجاح على كل المستويات. أصبحت الرصاصة الأيقونية لعصر الثورات النسائية في القرن الحادي والعشرين. كان هناك أمل للنساء في جميع أنحاء العالم.

لعب الجيش النسائي لوحدات حماية المرأة ، الذي تم تشكيله بعد الثورة بفترة وجيزة ، دورًا مهمًا في الدفاع عن ثورتنا. أصبحت نساء YPJ كوابيس داعش. بحربه غير الأنانية دافعنا عن أراضي روج افا وثورة النساء. ظهرت ثورتنا في شخص نساء مثل ارين ميركان و سارية دنيز و افيستا خابور و بارين كوباني وآلاف النساء اللواتي لا يمكننا إحصاء أسمائهن.

التمثيل المتساوي ، النظام الرئاسي المشترك ، المنظمات النسائية التي تتمتع بالحكم الذاتي كانت العناصر المكونة لثورتنا. تم إنشاء منظمات مثل HPC-Women و Women's Security و Women's Justice Assemblies. الزواج في سن مبكرة والزواج الزائد محظوران. اكتسبت المرأة حقوقًا مثل الإفراج عن المرأة والميراث وسجنها. لكن لا يزال هناك شعور بالشكليات وهيمنة الذكور. إن مهمة دفاع الثورة نحو مستوى الاشتراكية أمامنا. في نفس الوقت

اليوم يستمر واجبنا في الدفاع عن الثورة. بعد أن حققت ثورتنا انتصارًا واضحًا ، احتلت الدولة التركية وعصاباتها بقيادة الولايات المتحدة وروسيا عفرين ، ثم سري كانيه وكري سبي. يريد المحتلون تدمير وجود وهوية المرأة. تم اختطاف مئات النساء قسراً ، بل تعرضن للتحرش والاغتصاب. حتى الآن نحن نواجه خطر هجمات جديدة. كشعب فلسطين ، نحن مدينون لأنفسنا بالتحضير لحروب طويلة ونضال ومقاومة الشعب المسلح. نحن كشعب في شمال وشرق سوريا لدينا تجارب مهمة معًا. دعونا كشعب ننظم أنفسنا ونجهز أنفسنا كجنود من السنة السابعة إلى السبعين. يحتاج الجميع إلى الاستعداد للهجمات المحتملة من خلال تعلم الأسلحة. ينبغي أن يكون لكل فرد مكان في التجمعات والتجمعات. يجب أن نحاول تنظيم شعبنا في هذه الأماكن. نحن بحاجة إلى وضع قوات حماية الجوهرية (HPC). ضد كل الهجمات بالقوة التي نأخذها من شهيداتنا نتخذ الصدارة في المقاومة المسلحة للشعب. نحن بحاجة إلى النضال ضد أساليب الحرب المحددة التي أدت إلى الانهيار الداخلي للثورة ، وتدمير التحالف بين شعوبنا ، وتقوية الثقافة المنحلة للرأسمالية ، والأهم من ذلك ، إلى هدف ثورة نسائية

النساء الشيوعيات اللواتي نظمن أنفسهن داخل منظمة المرأة الشيوعية لديهن برنامج ثوري للسلطة النسائية منذ بداية الثورة وحتى اليوم ، وقد أخذنا مكانهن في الدفاع وكذلك في مجال بناء الثورة بمكافآت كبيرة. وبنفس الطريقة ، أصبحت النساء الشيوعيات اللاواتي ينشرن مع منظمة المرأة الشيوعية معرفتهن بالثورة النسائية ودفاع النساء عن النفس ، الرائدات الشيوعيات في ثورة النساء. من أول شهيدة لـ MLKP في روج افا سارية دنيز ، كانت إيفانا هوفمان و رابرين دجلة إلى طليعة الشباب الشيوعية زيلان دستان قادة النساء الشيوعيين في الكفاح المسلح.

إن الحفاظ على ثورة المرأة وتطويرها ، وتصعيد الثورة النسائية في الشرق الأوسط سوف يكون ممكنا من خلال صعود النضال من أجل تحرير المرأة. واليوم نحن نضع هذه المهمة بشرف على عاتقنا كنساء. ثم لا ينبغي أن نذهب ثلاث أو أربع خطوات معًا. بأسلحتنا على أكتافنا بينما ننظم أنفسنا في صفوف TKŞ و JKŞ و CKŞ التي لديها برنامج ثوري وشيوعي ، نقوم بهذه المهمة بشرف. سنفوز بالتأكيد.

JKŞ: Jinên Efganîstanî ne bi tenê ne

Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) êrîşên Talîban ên li ser jinan şermezar kir. Endamên JKŞ'ê li Qada Jin Azad kom bûn û lafîtaya "Bijî Berxwedana Jinên Efganîstanî" vekirin. Di çalakiyê de diwîzên "Jin Jiyan Azadî", "Jinên Efganîstanî ne bi tenê ne", "Bijî Berxwedana Gelên Efganîstanê" hatin hildan.

Azadiya Jinên Efganîstanî Hat Desteserkirin

Bahar Kobanê bi navê JKŞ'ê daxuyanî xwend û diyar kir ku Talîban weke DAÎŞ'ê xwedî hişmendiyeke dijminê jinan e. Bahar pêkanînên Talîban ên di dema rêveberiya xwe ya di navbera 1996 û 2001'ê de bîr anî diyar kir ku jinan hîn ew roj ji bîr nekirine.

Bahar Kobanê anî ziman ku di dema ku Talîban desthilatdar bû mafên jinan ên xebitîn û xwendinê hatibûn desteserkirin çerşef hatibû mecbûrîkirin. Jinên ku ev qanûn pêk neanîbin an bêvil û destên wan hatine jêkirin an jî bi navê recme hatine kuştin.

"Ji sedî 90'ê jinan xwendin nizanîbûn, di 16 saliya xwe de dihatin zewicandin, mafên wan ê mîratê tune bû û destdirêjî ne sûç bû. Îro jî jin di desthilatdariya Talîban de mahkûmî jiyaneke tarî tên kirin. Jin nikarin ji malan derbikevin, tên qetilkirin. Jin ji bo bi darê zorê bi leşgerên Talîban re neyên zewicandin xwe ji ser baniyan davêjin."

Heman hişmendî di herêmên dagirkirî de êrîşî jinan dike

Bahar kobanê li herêmên dagirkirî êrîşên dewleta Tirk ên li dijî jinan bi bîr xist û wiha axivî: " Yên ku li herêmê dagirkirî ji êrîşên ku li ser jinan tên meşandin re bêdeng dimînin stendina desthilatdariyê ji hêla Talîban re erê kirin."

Bahar Kobanê anî ziman ku têkoşîna azadiya jinê mezin dibe û wiha domand: "Jin bi hêza ku ji hev digirin li hemberî pergala zilamperest têkoşîna xwe didomînin. Li Rojava hêza DAÎŞ'ê ya ku bi Talîban re xwedî heman hişmendiyê ye bi pêşengtiya YPJ'ê û bi hêza jinan hate şkenandin. Me piştgiriya jinên Efganîstanî ya di wê deme de ji bîr nekir. Em dizanin ku jinên Efganîstanî xwedî tecrûbeyên rêxistinbûn û têkoşînê ne. Îro jî li hemberî Talîban li ber xwe didin. Em denge xwe ji şoreşa jinê tevlî denge wan dikin û em bang dikin ku wê Talîban binkeve, wê jinên Efganîstanî yên berxwedêr biserbikevin."

المرأة الشيوعية الثورية:نساء أفغانستان ليس لوحدهم

أستنكرت المرأة الشيوعية الثورية (JKŞ) هجمات طالبان على النساء. تجمع أعضاء JKŞ في ساحة المرأة الحرة وفتحوا لافتات"عاشت مقاومة النساء الأفغانيات". ورفعت خلال العملية شعارات "المرأة تعيش الحرية" و "المرأة الأفغانية ليست وحيدة" و "عاشت مقاومة الشعب الأفغاني".

حرمان حرية المرأة الأفغانية

قرأت بهاركوباني بيانًا بأسم JKŞ وذكرت أن طالبان ، مثل داعش ، لديها وعي مناهض للمرأة. وأشارت بهار إلى تصرفات طالبان خلال فترة إدارتها بين عامي ١٩٩٦ و ٢٠٠١ ، مشيرة إلى أن النساء لم ينسن ذلك اليوم بعد.

ونكرت بهار كوباني إنه عندما وصل طالبان إلى السلطة ، تم انتهاك حقوق المرأة في العمل والدراسة. أما النساء اللواتي لم يتبعون للقانون فقد تم قطع انفهم أو قتلهن بالرجم.

تسعون في المئة من النساء الأميات تزوجن في سن السادسة عشرة. لم يكن له حق في الميراث ولم يكن التعدي جريمة . . وحتى اليوم ، فإن النساء في نظام طالبان محكوم عليهن بحياة مظلمة. لا تستطيع النساء مغادرة منازلهن ، إنهن يتعرضن للقتل. "النساء يرمون أنفسهن من فوق السطح لتجنب الزواج قسرا من جنود طالبان". نفس العقلية تهاجم النساء في المناطق المحتلة

تستذكر بهار كوباني اعتداءات الدولة التركية على النساء في الأراضي المحتلة وقالت: "أولئك الذين يلتزمون الصمت في الأراضي المحتلة بشأن الهجمات على النساء وافقوا استيلاء طالبان على السلطة".

قالت بهار كوباني إن النضال من أجل حرية المرأة سيكبر وهكذا استمرت: "تواصل النساء النضال ضد النظام الذي يهيمن عليه الذكور بالقوة التي يحتفظن بها. في روج افا ، تحطمت قوة داعش ، التي تشترك في نفس الوعي مع طالبان ، بسبب قيادة وحدات حماية المرأة وقوة المرأة. لم ننسى دعم النساء الأفغانيات في ذلك الوقت. نحن نعلم أن النساء الأفغانيات لديهن خبرة في التنظيم والنضال. . اليوم ما زالوا يقاتلون ضد طالبان. ندعو الثوار للانضمام إليهن وندعو أن طالبان سيقع. "مقاومة النساء الأفغانيات ستنتصر".

JKŞ'ê bi boneya 19'ê Tirmehê semîner û şahî li dar xist

Kobanê-
Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) li Kobanê bi serenavê "Parastin û pêşxistina destkeftiyên şoreşa jinê" panêlek li dar xist. Berdevka JKŞ'ê Fadya Sîdo, mamoste Necah Elî û Rêvebera CKŞ'ê Ivana Baran tevlî panele bûn.

Ji bo têkoşîna li dijî zilamperstiyê em rêxistinbûna xwe mezin bikin

Berdevka JKŞ'ê Fadya Sîdo axaftina destpêkê kir û diyar kir ku tiştê ku berî 10 salan nedihat bawerkirin ku bibe jinan biser xist û wiha domand: "Me desthilatdariya dewleta Sûriyeyê li welatê xwe rûxand. Me şoreşa jinê pêk anî. Şoreşa me rastî gelek êrîşan ma. Me bi saya şehîdên xwe şoreşa xwe parast. Dewleta Tirk a ku dijminê me yê herî mezin e bi piştgiriya Emerîka û Rûsya Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî dagir kir. Lê îrada me neşkest. Jinan di nav refên YPJ'ê de di herî pêşî de cihê xwe girtin. Jinan li gel qada leşgerî di qada siyasî û jiyana civakî de jî rêxistinên xwe ava kirin. Zagon û mafên jinan di xalên herî pêş de hatin avakirin." Sîdo di dawiya axaftina xwe de bang li hemû jinan kir ku di nav refên JKŞ'ê de birêxistin bibin û li şoreşa xwe xwedî derkevin.

Pêwîst e jin şoreşê pêş bixin

Neccah Elî jî wiha axivî: "Şoreşa me bi berdêlên mezin hat avakirin. Jinan di serî de li Kobanê û hemû enyan bi me de roleke girînk a jinan heye."

"Îro erka herî girîng pêşxistina şoreşê ye. Di mile pêkanîna qanûnên jinan de di cavaka me de paşketinek heye. Pêwîst e em li ser sedemên vê bisekinin. Her jin berpirsiyarê pêkanîna qanûnên me ye. Pêwîst e em şoreşa xwe bimeşînin û ber bi sosyalîzmê ve bibin."

Li ser navê CKŞ'ê Ivana Baran axivî û wiha got: "Bi şoreşê re her kesî dît ku dema şertên jinan pêk tên çawa lehengiyên mezin dinivisînin. Me di kesayetên weke Arîn, Sarya Ozgur, Avesta, Raperîn Dîcle, Destan Temûz de dît ku jin çawa dibin vîn. Têkoşîna şehîdên Pirsûsê nîşanî me da ku têkoşîna şoreşê sînoran nas nake. Em ê jî di şopa wan de bimeşin."

Dirbêsiyê-

JKŞ'ê bi boneya pîrozkirina 19'ê Tirmehê li Parka Şehîd Zevîn şahiyek jinê li dar xist. Di şahiyê de li ser navê JKŞ'ê Nûjiyan Baran axivî û şehîdên şoreşê bi bîr anî. Baran wiha berdewam kir: " Şoreşa Rojava weke şoreşa jinê hat naskirin. Jinan şoreşa xwe ava kirin û diparêzin. Jin ji ber vê dibin hedefa êrîşan. Jinên komûnîst jî ji destpêka şoreşê ve berdêlên mezin dan."

Ciwan di riya şehîdan re dimeşin

Li ser navê CKŞ'ê jî Destan Serhed axivî û wiha got: " ji her milî êrîş hene, dixwazin ku vîna me bişkînin. Li Garê, Avaşîn û Heftanînê êrîşî me dikin. Lê qet nikarin vîna bişkînin. Em weke ciwanên Rojava her dem dibêjin em amade ne ku di riya şehîdên xwe re bimeşin. "

Piştî axaftinan bername bi şahiya stranan û govendan berdewam kir.

Hesekê-

TKŞ û JKŞ li Hesekê jî panêlek li dar xistin. Di panêlê de li ser navê TKŞ'ê Cemîl Sîdo axivî û wiha got: "Şoreşa Rojava di pêşengtiya gelê Kurd de li hemberî paşverûtiya BAAS pêk hat. Şoreşa Sûriyê di esasê xwe de li Der'ayê dest pê kir lê bele ev srhildan di demeke kurt de ket bin bandora hêzên paşverû. Rojava di wê pêvajoyê de riya xwe vekir û ber bi şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve çû."

Seydo bal kişand ser êrîşan û wiha axivî: "Destkeftiyên şoreşa me di bin xeteriyeke mezin de ne. Pêşî Efrîn, piştî wê jî Serê Kaniyê û Girê Spî hat dagirkirin. Ev êrîş di dema ku me xwest avakirina şoreşa xwe ya civakî xurt bikin de pêk hatin. Lê bele em ê şoreşa xwe rûxmî hemû êrîşan biparêzin."

Seydo , Şehîdên Pirsûsê jî bi bîr anî da xuyakirin ku wan di berxwedana xwe de didin jiyandin.

Pêwîst e jin bibin îradeyeke xurt

Di panêlê de li ser navê JKŞ'ê jî Fadya Sîdo axivî û di destpêkê de Zîlan Destan a ku di 13'ê Pûşberê de li Qamişlo şehîd ketibû bibîranî. Sîdo wiha domand "Jinên ku zexta pergala zilamperest jiyan dikirin bi saya şoreşê jiyana xwe guherandin. Me dît ku jiyana nû ji ya bere xweştir e. Ji bo vê pêwîst e jin li şoreşê xwedî derbikevin." Çalakî bi temaşekirina sînevîzyon û gerandina govendan berdewam kir.

Qamişlo-

JKŞ'ê li Qamişlo Şahiya Jinan Li Dar Xist. Endamên Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) li Qamişlo salvegera Şoreşa Rojava bi jinên di kargeha biskiwîtan de dixebitin re pîroz kir.

Şahî li bexçeyç kargehê hat lidarxistin û lafîteya ku tê de "Ji Saryayan heta Zîlanan em şoreşa jinê mezin bikin" hatiye nivîsandn hat daliqandin.

Şahî bi rêzgirtina ji bo şehîdan hat destpêkirin û li ser navê JKŞ'ê Fadya Sîdo axaftinek kir. Sîdo, bal kişand serdestkeftiyên ku jinan bi şoreşê re bi dest xistine. Sîdo piştre êrîşên li ser şoreşê vegot û banga parastina şoreşê li hemû jinan kir.

Sîdo bal kişand ku şoreş bi berdêlên mezin tê jiyandin û bal kişand ser van xalan: "Sarya li Kobanê, Îvana li Til Temir, Raperîn li Minbic, Destan li Reqa, Zîlan jî dema li Qamişlo şoreş mezin dikir şehit ket. Em ê ji Sarya heta Zîlanan şoreşa xwe mezin bikin." Piştî axaftinan jinan govend gerandin û salvegera şoreşê pîroz kirin.

نظمت المرأة الشيوعية الثورية ندوة وأحتفالية من اجل ١٩ تموز.

كوباني-

نظمت المرأة الشوعية الثورية ندوة في كوباني تحت عنوان"الحماية والتقدم من أنجازات ثورة المرأة" وأنضموا إلى هذه الندوة المتحدثة بأسم المرأة الشيوعية الثورية فادية سيدو,المعلمة نجاح علي والأدارية في الشبيبة الشيوعية الثورية أيفانا باران.

سنكبر تنظيمنا من أجل النضال ضد الذهنية الذكورية

وبدأت المتحدثة بأسم المرأة الشيوعية الثورية فادية سيدو وأوضحت أن الأشياء الذي لم يصدقونها ان تحدث من قبل ١٠ سنوات اليوم المرأة فعلتها وهكذا استمرت"نحن دمرنا سلطة الدولة السورية في وطننا.ونحن حققنا ثورة المرأة.ثورتنا بقيت تحت الكثير من الهجمات.ونحن بفضل شهدائنا حمينا ثورتنا.الدولة التركية هيا العدو الأكبر لنا احتلت سري كانييه"كري سبي"وعفرين بمساندة من أمريكيا وروسيا.ولكن رغم هذه إرادتنا لن تنكسر.المرأة أخذت مكانها في الصفوف الأمامية في وحدات حماية المرأة.المرأة أسست تنظيمها في الصفوف العسكرية والسياسية وفي حياة المجتمع ايضاً. الحقوق والقوانين المرأة تأسست في النقطة الأمامية.سيدو في ختام حديثها دعت جميع النساء للتنظيم في صفوف المرأة الشيوعية الثورية وكونوا اصحاب للثورة.

يجب على المرأة ان تطور الثورة

هكذا قالت نجاح علي"تأسست ثورتنا على بدل كبير.في البداية قاتلت المرأة بكل شجاعا كوباني وجميع الجبهات.ويوجد دور كبير للمراة في انتصار ثورتنا.

"واليوم العمل الأكثر اهمياً هوا تقدم الثورة.ومن جهة تنفيذ قوانين المرأة في مجتمعاً يوجد تقدم.ويجب أن نقف على هذه الأسباب. كل مرأة هيا مسؤولة على قوانيننا.يجب علينا ان نسير في ثورتنا ونوجهها إلى الأشتراكية

سنقدم لثورتنا كفاح بلا حدود

القت المتحدثا بأسم الشبيبة الشيوعية الثورية أيفانا باران وقالت:ان الكل رأى عندما تحقق شروط المرأة ان الثورة تسجلها بشجاعة كبيرة. ونحن رأينا بشخصيات مثل أرين"ساريا اوزكور"افيستا"رابرين دجلة"دستان تموز"كيف أصبحوا أمال.ونضال شهداء برسوس أظهرت لنا أن نضال الثورة لا تعرف الحدود.ونحن سنسير على خطاهم.

الدرباسية-

المرأة الشيوعية الثورية بمناسبة ذكرى ١٩ تموز نظمت احتفالية في حديقة الشهيدة زفين.والقت نوجيان باران المتحدثا بأسم المرأة الشيوعية الثورية كلمة وذكرت شهداء الثورة.واستمرت باران:ثورة روج افا انعرفت بأسم ثورة المرأة.المرأة اسست ثورتها ودافعت عنها.ومن أجل ذلك المرأة تكون الهدف في الهجوم.المرأة الشيوعية ضحت ببدائل كثيرة من البداية.

الشباب يسيرون في طريق الشهداء

القت المتحدثا بأسم الشبيبة الشيوعية الثورية دستان سرحد وقالت:يوجد هجومات من كل الأطراف.ويريدون كسر إرادتنا. ويهاجمونا في كاري,افاشين,وحفتانين.ولكن لم يتمكنوا من كسر إرادتنا.ونحن كشبيبة روج أفا دائما نقول أننا مستعدين أن نمشي في طريق شهدائنا.

وبعد الخطابات استمر البرنامج بالأحتفال الأغاني والدبكة.

الحسكة-

نظمت الحركة الشيوعية الثورية والمرأة الشيوعية الثورية ندوة حوارية.

وفي الندوة الحوارية القى جميل سيدو المتحدث بأسم الحركة الشيوعية الثورية كلمة وقال فيها.نفذت ثورة روج افا ويقادات من الشعب الكوردي بوجه الرجعيون من النظام البعث.الثورة السورية من الأساس بدأت في درعا ولكن هذا الثورة بفترة قصيرة وقعت بين تأثير القوات الرجعية.وبهذه المسيرة فتحت روج افا طريقها وأتجهت نحو ثورة شمال وشرق سوريا.

لفت سيدو الأنتباه على الهجومات وهكذا قال:انجازات ثورتنا تحت خطر كبير.وأحتلت في البداية عفرين, وبعدها سري كانييه وكري سبي.ونفذت هذه الهجومات عندما ادنا تقوية بناء ثورتنا المجتمعية .ولكن سندافع عن ثورتنا رغم كل الهجمات.

سيدو,ذكرى شهداء برسوس وأظهر انهم يعيشون في مقاومتنا.

يجب ان تكون المرأة صاحبة إرادة قوية

وفي الندوة الحوارية تكلمت فادية سيدو المتحدثا بأسم المرأة الشيوعية الثورية وفي البداية ذكرت الشهيدة زيلان دستان التي استشهدت في ١٣ حزيران في قامشلو.استمرت سيدو"المرأة التي عاشت تحت صعوبات الذهنية الذكورية بفضل الثورة تغيرت حياتها.ورأينا ان الحياة الجديدة أجمل من الحياة القديمة.ذلك يجب على المرأة ان تكون صاحبت هذه الثورة.

وأنتهت الندوة الحوارية بمشاهدة التلفزيون وبعدها استمرت بالدبكة.

نظمت المرأة الشيوعية الثورية في قامشلو حفلة نسائية

نظمت اعضاء من المرأة الشيوعية الثورية في قامشلو احتفالية مع نساء الذين يعملون في معمل البسكويت بمناسبة ذكرى ثورة روج افا.ونظموا الأحتفالية في حديقة المعمل ووضعوا لافتات مكتوب عليه"سنكبر ثورة المرأة من ساريا حتى زيلان"

بدأت الأحتفالية بدقيقة صمت على أرواح الشهداء والقت فادية سيدو المتحدثا بأسم المرأة الشيوعية الثورية كلمة.سيدو,لفت الأنتباه على الأنجازات التي اكتسبتها المرأة في الثورة.وبعدها تكلمت سيدو عن الهجومات على الثورة ودعت جميع النساء على حماية الثورة. سيدو لفتت الأنتباه ان الثورة تعاش ببدائل كبيرة ولفتت الأنتباه على هذه النقاط"ساريا في كوباني"إيفانا في تل تمر"رابرين في منبج"دستان في الرقة"وزيلان استشهدت في قامشلو عندما كانت تكبر الثورة.ونحن سنكبر الثورة من ساريا حتى زيلان."

وبعد الخطابات بدأت النساء بالدبكة وباركوا ذكرى تأسيس الثورة.